EY MIROV!

Kêmasiya Te …

… Îsa Mesîh e!

– Tu hesretkêşê aştî, şadî û bextewariyê yî. Lê belê gava bextewariya rasteqîn nabîne, hundirê te vala dimîne.

– Mirin, şer û pevçûn û bêtariyên ku em her roj dibihîzin, dinê dixe toqînê. Mirov ji her tiştî gûmandar, her tim bi tirs dijî. Ma ka em dizanin dê hîn çi bê serê me?

– Dawiya vê dinê nêz e. Dê Xelaskerê dinê Îsa Mesîh, dîsa were û hemiyên ku bi Wî baweriyê anîne bibe bihuştê.

– Em hê dema dilovaniyê dijîn. Lê di nêz de bona her kesê ku Mesîh Îsa red kirine, dê 'Roja Daraziyê' were. Vana bona abadîn ezabê bikêşînin dê bêne daraz kirin. Abadîn helaqbûn!

– Ya mirovê xoşewîst, ger te tobe nekiribe û bi navgîniya Îsa Mesîh li gunehên te nehatibin bexşandin, tuyê jî di nava yên ku bêne darazkirinan de be. Îsa Mesîh, bona te jî bi Xwedayê Pîroz re li hevbîne, li Golgatayê, li ser darexaçê, bi jankêşiyê mir û mirinê bindest kir û dîsa vejiya.

Kurdisch (Dir, o Mensch, fehlt Jesus Christus)

– Zêde nesekine, hema li ber Xwedayê Bilind çong deyne û li gunehkariya xwe mukir bê û bona ku li te bibexşîne reca bike. Ew dê li te bibexşîne û tuyê gellekî dilşa bibe. Bi vî awayî li pêy Xelasker Mesîh Îsa here!

Tu îroj dijî
Hê nebûye sibê
Îroj tobe bike!
Ji ber, dibe ku sibê rewş bête guhertin!

– **"Dema munasîb a vay, niha ye. Roja xelasiyê a vay, niha ye!"** (2. Korîntiyan 6:2)

– Bona tobekirinê niha derfeta te heye, bo wê yekê hema tobe bike!

– Îsa Mesîh te dawet dike!

Gelo pirsên we hene? Ji kerema xwe ji me re binivîsînin. Em ê bi kefxweşiyê bibersivînin.

Navnîşana Me Ev e:
Hoffnung und Leben e. V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany